 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

 *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 13

# Lîstika Mîtologiya
# Ji Xweda Işkûrê Somerî heya Îmam Eliyê Îslamî

## Lîstika Mîtologiya:

Heyanî dehsalên heftî û heyştî jî yên sedsala bîstan, dema ji ewran da birûsk diteyisî (dibiriqî) û guregura ewran berî destpêka baranê dihat, hin jin û mêrên gundê me (gundê Kurzêlê li herêma Efrîn, Çiyayê Kurmênc) digotin: Va ye *Îmamn Elî* ewr dane ber xwe û bi qirbacê li wan dixe; ji lew ra, ew diteyisin (dibiriqin) û dikin guregur. Di civaka me ya herêma Erfrînê da, ev şîrovekirin ya here naskirî bû. Belkî ev şîrovekirin li hin herêmên Kurdistanê yên din jî wisa bû; û belkî li seranserê rojavayê Asiyayê jî.

Ev diyarde di bingeha xwe da mijareka hişyarbûnê ye. Gelo ev hişyarbûneka pir nizim û destpêkî ye ku nikare diyardeyên suriştê şîrove bike, yan ev li ser bingeha zanîneka zanistî hatiye avakirin? Belê raste, em bi laş û bedena xwe di sedsala bîstan da dijiyan, heyama bomba atomî û derketina esmanan, lê belê, em bikin-nekin, em hên di bin bandora hin baweriyên heyama Neolîtîk (heyama kevirî ya nû 12000 - 6000 b.z.) da bûn. Ma gelo! Me yê ji kû zanîbûya ku diyardeya birûsk û guregura ewran di rastiyê da valakirina barkirina elektirîkî (kahrevayî) ya erênî û neyînî (plûs, mînus) di navbera du ewran da, yan jî di navbera ewran û zemînê da ye? Me yê ji kû zanîbûya ku di hundirê ewran da pestan û radeya germahiyî pir bilind dibe, û bi encama valakirina barkirina elektirîkî ev teqandin pêktê û ev dengê guregurê jê derdikeve?

Başe! Heger rewşa me di nîveka duwem ya sedsala bîstan da hên ev rewş bû, ma gelo! tiştekî pir bi fêş û ecêbe ku pêşiyên mirovan yên kevin, vê diyardeya "birûsk, guregura ewran û hatina baranê" bi şêweyekî efsanewî şîrove kiribin û gotibin, ev bi destê xwedayan yan nîv-xwedayan pêktê?.

Di hezarsala çarem b.z. da gelê somerî ji çiyayên jor, ji erdnîgariya şaristaniya *Guzana* (bi erebî kirine Til Helef) ya kurdistanî da gihîşte başûrê Mêzopotamiya, û navê welatê xweyî nû kirin "*Ki. En. Gi*". Wan li wê herêmê - li gor pîvanên wê demê - şaristaniyeka pêşketî avakirin. Wan bawer kir ku ji bo bahoz û baranê xwedayekî taybet heye, navê wî "*Işkûr*" (*Îşkûr*)-e; ew li ewrên bi birûsk û li bahozan siwar dibe û baranê direşîne. Wan bawer kir ku ev xwedayê "*Işkûr*" lawê xwedayê mezin "*An" (Anû*), xwedayê esmanane. Nîşana xweda "*Işkûr*" birûsk bû, di teşeyê melêbeka sêgoşeyî û dubarekirî da bû, xwediyê birûskên şeşper ku dişibihe çilên daran yan jî tiliyên pêlpêlî[1].

Di hezarsala sêhem b.z. da *Akkadiyên* ku ji biyabanê da hatin, welatê Somer dagîrkirin. Wan bi xwedayê *Someran* "*Işkûr*" bawer kir û nav lêkirin "*Eded*"; û birûsk jî jêra wek nîşan ma. Bi gelemperî xweda "*Eded*"-ê mêzopotamî hêzeka hem kavilkar û hem comerd bû; ew xwedayê kanî, baran û lehiyan bû; li bapeşk û bahozan siwar dibû. Di hin wêneyên xwe da, wî mîtanekî kurt li xwe kiriye û li herdu rexên seriyê wî du qoç (qiloç) hene, ew li ser pişta gayekî ye, di destê rastê da çeka birûskê heye. Navê kebaniya wî "*Şala*" ye; ew di bingehê da ji xwedaya horî "*Şaleş*" (*Şeluş*) hatiye[2].

Li ba *Kaşşiyan* (ji pêşiyên Kurdan) ev xwedayê somerî "*Işkûr*" bi navê "*Bûriyaş*" (*Buriash*) hatiye naskirin û li ba *Horiyan* jî (ji pêşiyên Kurdan) bi navê "*Tişûp*" (*Teshup*) hatiye naskirin. *Hittîtan* jî ew her bi wî navî ji *Horiyan* birine. Li ba *Ûrartiyan* (neviyên Horiyan) bi navê "*Tayşîpa*" hatiye naskirin. *Aşûriyan* jî ji vî xwedayî ra perestî kiriye; ji wî ra li bajarê Aşûr perestgehek avakirine û ew xweda bi xwe ye ku li Sûriyayê jî bi navê "*Eded*" (*Heded, Ĥeded*) hatiye naskirin, wek xwedayê baranê, birûsk û lehiyan. Li ba *Fînîqiyan* (rûniştivanên kenarên deryayê li Sûriya û Libnana niha) ev xweda bi navê "*Be'il*" û "*Edonîs*" hatiye naskirin[3].



wêneyekî din yê
Xweda Eded



Xweda Eded

Li ba *Cihûyan*, xwedayê bahoz û baranê bi navê "*Yehwe*" hatiye naskirin. Ew xwedayê yekane yê gelê Îsraîl bû. Ew ji wan ra di hundirê ewran da xuyadibû û hêza xwe bi birûsk û bahozê dida xuyakirin; ew di bingehê da xwedayê bahoz, birûsk, guregura ewran û baranê bû. Ewe yê ku gelê Îsraîl ji biyabana Sînayê ajot û gihande erdê Ken'an (Filestîn)[4].



Xweda Eded (Be'il) yê sûrî

## Gelo arîşe çi ye?

Arîşe (pirsgirêk) lîstika mîtologiya di her heyamekê da ye û di çanda her gelekî da ye. Mebesta me arîşeya şîrovekirina mîtologî ji bûyer û diyardeyên suriştê ra ye. Ev şîrovekirin di heyamên pir kevin da tiştekî pir asayî bû, ji ber ku wê hîngê zanîna mirovan ya zanistî pir xizan û lawaz bû. Lê belê, ev arîşeya han pir mezin bû, û bû pirsgirêkeka lihevketî dema ku ev şîrovekirinên efsanewî ji bermaya mîtologî derbas bermaya ayînên mezin bûn (Cihûtî, Zerdeştî, Kirîstiyanî, Islametî), ketin nav wan û bûn beşekî bingehîn ji baweriyên wan.

Bi temamî, eve tiştê ku bi serê xwedayê somerî "*Işkûr*", xwedayê bahoz, birûsk û baranê hat. Bi derbasbûna heyamên dîrokî û di navbera çand û sazûmanên mîtologî yên cihêreng da, ev xweda hate guhartin û bû "*Bûriyaş*", bû "*Teşûb*", bû "*Tayşîpa*", bû "*Eded*", bû "*Be'il*", bû "*Edonîs*" û di pey ra bi awayê "*Yehwe*" kete nav ayîna Cihûtiyê. Di pey ra ew jî derbas kir û kete bermaya ayîna Îslametiyê û di nîgaşa îslamewî-gelêrî da bû kesayetiya *Îmam Elî Bin Ebî Talib* ku ew jî pismamê pêximber *Mihemmed* û malxiyê keça wî *Fatîmayê* ye; ew kesayetiya ku di bermaya îslamî da bi hêzdarî, dilêrî zanînê tê naskirin.

Bi her hal tevlêkirina xwedayê bahoz, birûsk û baranê yê mîtologî li gel kesayetiya *Îmam Elî* di bermaya *Şî'etiyê* da hatiye xuyakirin; bi taybetî jî bermaya *Yarsanî (Kakayî)* û *Alawî (Elewî)* ya ku bingeha xwe kurdistanî ye. Di rastiyê da ti peywendiya ola yarsanî û alawî bi Îslametiyê ra tineye; ne ji ailyê bawerî û ne jî ji aliyê felsefeyî da. Lê belê, ji hêlekê da daku ew Îslametiyê wernegirin û ji hêla din va, xwe ji sûcê "kufrê", ji kuştinê biparêzin, çîna pîr ya wê demê hin têgihîn û şêwazên îslamî-şî'eyî standin, ji ber ku ramana şî'eyî bi ramana suneyî ya serdar ra dijber bû, her û her hin têgihînên felsefî yezdanî teve şî'etiyê bûbûn. Wergirtina kesayetiya *Îmam Elî*, yek ji şêwazên here pêşîn bû ku ji îslametiyê hate wergirtin. Pîr û şêxên *Yarsanan* û *Alawiyan* mijara guhartin û derbasbûna giyanê mirovan ji laşekî heya bi yê din wek naweleka (aleteka) felsefî girtibûn dest ku peywendiyekê di navbera ola xwe û îslametiyê da pêkbînin.

Arîşeya here tirsnak û xeternak ewe ku tevlêkirina baweriyên mîtologî li nav ayînan, piştî wê demê bû bend û kelem li ber pêşketina zanîna zanistî û şaristaniyê û êdî her kesê ku guman dixiste wan baweriyan yan jî ew nedipejirandin, bi kufir û nebawermendiyê dihate

sûcdarkirin. Wek nimûne li ser vê mijarê, em dikarin biryara Vatîkan ya sala 1600 z. bi nav bikin, ku zimanê zaniyarê astronomiyê yê îtalî *Giordano Bruno* bê qutkirin û ew jî bê sotandin. Çima? Ji ber ku ew li ser baweriya xwe rawestiya ku zemîn li dor rojê digere û ne bi vajayî wê. Ev jî ne li gor şîrovekirina ayînî bû ku bawerdikirin zemîn nawenda gerdûnê ye û her tişt li dor wê digere. Helbet, ev şîrovekirin li ser bingeha tiştên di Tewratê da, hatiye avakirin. Bi me ra berê jî çîroka pêkhatina cîhanê ya tewratî derbas bû ku di bingehê da ji çîroka pêkhatinê ya somerî hatiye standin[5].


Giordano Bruno

Emê di xelekên dahatî da bibînin ku çîroka *Tofanê* jî ne li dervayî van guhartinên mîtologî ye.

Çarşemb, 24.06.2015

## Jêder

[1] Samuel Kreimer: Ji tabloyên Somer, rûpel 68, 181. Xezel El-Majdi: baweriyên Aramî, rêpel 59.
[2] Sabatino Muscati: Şaristaniyên Samiyan yên kevnar, rûpel 258.
[3] William Langer: Berfirehiya dîroka cîhanê, 1/62. Ebdul haemid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 147. Mourice Kroucier: Dîroka şaristaniyan ya gelemper, 1/207. Ehmed Fekhri: Lêkolîn li dîroka rojhilat ya kevnar, rûpel 105. Sabatino Muscati: Şaristaniyên Samiyan yên kevnar, 275.
[4] Sabatino Muscati: Şaristaniyên Samiyan yên kevnar, rûpel 149, 347.
[5] Hesen Nihme: Berfirehiya Mîtologî û efsaneyên gelan yên kevin, rûpel 105. H. G. Wels: Kurtahiya dîroka cîhanê, 2/298, 299. Fadil Ebdulwahid Ali: Ji Somer ta bi Tewratê, rûpel 204.